# RÊZIMANA KURDÎ AMADEYÎ

# 3

2020/2021

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya zimanê kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê.**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

**BEŞA YEKEM ........................................ 7**
NÊRÎNÊN DI DERBARÊ ZIMAN DE ........................... 8
**BEŞA DUYEM ........................................ 13**
VEQETANDEK ........................................ 15
RAVEK ........................................ 17
HEVALNAV ........................................ 29
HEVALKAR ........................................ 33
DAÇEK ........................................ 36
GIHANEK ........................................ 39
**BEŞA SÊYEM ........................................ 43**
HÊMANÊN HEVOKÊ ........................................ 44
**BEŞA ÇAREM ........................................ 51**
CUREYÊN HEVOKÊ ........................................ 52
**BEŞA PÊNCEM ........................................ 65**
DAHÛRANDINA HEVOKAN ........................................ 66
**BEŞA ŞEŞEM ........................................ 73**
XALBENDÎ ........................................ 74
DESTÛRÊN NIVÎSÎNÊ (RASTNIVÎS) ........................ 86

# BEŞA YEKEM

## Nêrînên di Derbarê Ziman de

## NÊRÎNÊN DI DERBARÊ ZIMAN DE

**Perwerdeya bi zimanê dayîkê, mafê herî girîng û bingehîn e. Di nava mafên sê nifşan de, cih digire. Di hevpeymanên Ewropayê de heye. Di hevpeymana mafên kesî, şaristanî û hevpeymana mafên abûrî, civakî û çandî ya Neteweyên Yekbûyî de jî ev maf heye.**

Ziman, hêmana sereke û ya yekem a lipêşxistin û bipêşvebirina civakbûnê ye. Navgîna ragihandina mirov, çand û civakan e. Sedema hebûna mirov e. Li ziman û çanda xwe xwedîderketin û lipêşxistina wan, pêwîstiya mirovbûnê ye.

A/ê ku li çand û zimanê xwe xwedî dernekeve, li tu tiştî xwedî dernakeve. Ên ku li van xwedî dernekevin, li mirovahiyê jî xwedî dernakevin. Kesên ku zimanê xwe nizanibin û bi pêş nexin, wê nîvçe bimînin; nikarin bi tu kesî/ê re, pêwendiyeke rast û durist, deynin û bi pêş bixin.

**Ziman beden e, çand beden e, erdnîgarî beden e, li bedena xwe xwedî derkevin.**

Weke encam, têgîna ziman heke weke rewşa ku kurd tê de ne, bê jiyîn, pir eşkere û diyar e ku weke civak di aliyê heyberî de, çi qas xizan û parçeparçe ye û di aliyê wate, sinc û bedewkariyê de jî wê nikaribe xwe ji jiyaneke şaş, çewt, xayîn û kirêt, rizgar bike.

**Ê/a ku qeyd û kelepçe li zimanê wî/ê hatibe xistin; li mejiyê wî/ê, li dilê wî/ê û li nêrîna wî/ê jî qeyd û kelepçe hatine xistin.**

Bandoreke pir mezin a binyata zimanê hêmayî, li ser hizir çêbûye. Ji zimanê bedenê rizgarbûn û li şûna wî bi peyvan hizirîn, dibe ku şoreşa herî mezin a hişmendiyê ya yekem be.

Ziman, ne tenê amûra hişmendiya civakî ye, di heman demê de, hêmaneke avakirina wê ye jî. Ziman, yek ji taybetiyên bingehîn ên ku civakekê dike civak û hebûna wê diparêze.

Weke amûra mejiyê hevbeş, nermahiya xwezaya civakî, pir bi lez bi pêş de dibe.

**Tu netewe bêyî ziman, nikare were hizirîn. Ji ber vê yekê, divê xebatên derbarê zimanê kurdî de, çalaktir bin.**

**Abdulah Ocalan**

- Ziman, navgîneke wisa ye ku divê di destpêkê de, hemû rêzan û rêbazên bikaranîna wî, bên zanîn.

Di heman demê de, rastbikaranîna ziman, armanceke ku berpirsiyariyên neteweyî, çandî û civakî disepîne.

- Ziman bi taybetî, hîm û taybetiyeke mirov û mirovbûnê ye û berhema jiyaneke hevkar, hevpar û civakî ye. Di nava têkiliyên hilberîn û danûstandinan de, weke navgîneke lihevkirin û jihevtêgihîştinê derketiye holê.

**Tevgera Ziman û Perwerdeyê**

- Bi wateyeke giştî, ziman navgîneke ku mirov raman, hest û daxwazên xwe pê ji hev re radigihînin û pêkhatina nîşanên din ên siyaset, zanist, wêje, ol û çandê bêyî ziman, ne pêkan e.

**Emîr Hesenpûr**

- Mohra qederê di mirovan de, ziman e.
- Ev zimanê we yê ku mîna dara bihiştê ya bi navê Tûba ye, ji ber xemsariya we, niha hişk û perîşan bûye. Ji ber vê yekê, ev ziman li ser navê miletperweriyê ji we bi gilî û gazin e.

**Se'îdê Kurdî**

- Kurdno, Malxerabino! Yan fêrî zimanê xwe bibin, an jî nebêjin em kurd in.
- Ziman, mercê heyînê yê pêşîn e.

**Celadet Elî Bedirxan**

- Di welatekî de, piştî binpêkirina zagonan, sûcê herî mezin binpêkirina, ziman e.

**Walter Lanoor**

- Rojekê hin diçin gel hizirmendê mezin Konfuçyûs û jê dipirsin û dibêjin: "Heke rojekê ji bo rêveberiya welatekî banî te bihata kirin, gelo karê ku te destpêkê bikira, wê çi ba?" Hizirmendê mezin bersiv da û got:

"Bêguman, min ê destpêkê ziman di ber çavan re derbas bikira. Ji ber vê yekê, heke ziman bi kêmasî be, gotin hizirê baş venabêjin. Heke hizir baş nehat vegotin, karên ku divê bên kirin rast nayên kirin, heke kar û peywir li gorî ku tên xwestin neyên kirin an jî pêk neyên, wê demê çand û dad wê xerab bibin. Dema ku çand û dad xerab bûn, wê demê dad wê bikeve rêya şaş. Dema ku dad ji rê derket, gelê ku ketiye nava şaştiyê, wê nizanibe ka wê çi bike û nizanibe ka encama wî karî jî wê bigihêje ku derê. Ji ber vê yekê jî tu tişt nagihêje girîngiya ziman."

**Konfuçyus**

- Ziman, nêrîn bi xwe ye.

**Karl Marks**

- Bi tenê zanîna ka pêwîst e çi bibêje têra kesekî/ê nake, divê zanibe ka wê çawa bibêje jî.

**Aristo**

- Axaftin, hunera mirov a bikaranîna hişê xwe ye.

**Platon**

- Ziman, divê bi tenê weke navgîna ragihandinê neyê têgihîştin. Ziman, navgîna têgihîştin, şîrovekirin û veguhestina hawîrdor, xweza û çandê ye. Di heman demê de, li gel hizir jî di nava têkiliyeke wisa xurt û qayîm de ye ku tu carî, ji hev nayên qutkirin.
- Ziman, hizir afirandiye û hizira mirov bi gotinan ve, girêdayî ye. Ziman ne tenê navgîneke vegotina rastiyan e, di heman demê de, yekpariyek di navbera ziman û hizirê de heye û ya herî girîng jî mercê mirovbûnê yê destpêkê ye.

**Wilhelm von Humbolt (Vîlhêm fan Homboylt)**

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Ziman, navgîneke sereke û bingehîn a civak û mirovahiyê ye. Li ser vê rastiyê, sê mînakan binivîse.
2. Xemsariya di derbarê ziman de, çi encaman bi xwe re tîne?
3. Têkiliya di navbera ziman û civakê de, diyar bike.
4. Li gorî Tevgera Ziman û Perwerdeyê, rastbikaranîna ziman berpirsiyariya kê ye?
5. Li gorî Konfuçyûs, lawaziya ziman çi encaman bi xwe re tîne?

## LÊKOLÎN

**Zimanê kurdî, ji kîjan malbata zimanan e, çend zaravayên zimanê kurdî hene û em bi kîjan zaravayê diaxivin?**

# BEŞA DUYEM

## Beşên Axaftinê

Peyv, li gorî wate û peywira xwe ji hev cuda dibin. Peyv di nava axaftinê de li pey hev rêz dibin, her yek ji wan xwediyê wate û peywirekê ye. Cihên wan li gorî wate û peywira wan a di nava hevokê de, diyar dibin.

Di kurdî de, deh cureyên peyvan hene, ew jî ev in: veqetandek, navdêr, hevalnav (rengdêr ), cînav, lêker, jimarnav, hevalkar (hoker), daçek, baneşan û gihanek. Ji van Cureyan, hin ji wan watedar in: navdêr, hevalnav, lêker, cînav, jimarnav û hevalkar. Her weha, hin ji wan jî erkdar in: gihanek, daçek û veqetandek.

Wane 1

# VEQETANDEK

Di kurdî de, du peyv bi alîkariya hin pêvekan bi hev ve tên girêdan, ji van pêvekan re, **veqetandek** tê gotin. Bi rêya veqetandekê, zayend û mêjera peyvan diyar dibe. Ji ber vê yekê, ji wan re veqetandek tê gotin. Di kurdî de, veqetandek li ser du cureyan tên dabeşkirin.

**Veqetandekên Binavkirî**

**1. “-a”**: Ji bo yekjimar û mê

Mînak:

- Dayîk**a** min mamoste ye.

**2. “-ê”**: Ji bo yekjimar û nêr.

Mînak:

- Heval**ê** baş, di roja giran de xuya dike.

**3. “-ên”**: Ji bo pirjimariyê ye (Nêtar e).

Mînak:

- Çav**ên** wê, reş in.

**Têbînî:** Gava ku veqetandek bi tena serê xwe tên bikaranîn ,cihê navdêrê digirin.

Mînak:

- Ev pirtûka kê ye?
- **A** min e ( pirtûka min e )

## Veqetandekên Nebinavkirî

**1. "eke"**: (Yekjimar, mê)

Mînak:

- Gul**eke** sor bide min.
- Jina azad, jin**eke** berxwedêr e.

**2. "ekî"**: (Yekjimar, nêr)

Mînak:

- Wan xaniy**ekî** biçûk ava kir.
- Agirî, çiyay**ekî** Kurdistanê ye.

**3. "ine"**: ( Pirjimar, nêtar)

Mînak:

- Gul**ine** baxçeyê me, bişkivîn.
- Heval**ine** Hogir, hatin dehlê.

### PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Veqetandekan pênase bike û cureyên wan diyar bike.
2. Veqetandek, çi diyar dikin?
3. Çend cureyên veqetandekan hene?
4. Sê mînakan, li ser veqetandekên binavkirî, binivîse.
5. Sê mînakan, li ser veqetandekên nebinavkirî, binivîse.
6. Kurtemijarekê (pênc xêzan) ku tê de, hemû cureyên veqetandekan hebin, binivîse

Wane 2

## RAVEK

### XETA SÊYEM

Di tevahiya cîhanê de, her mirov ji bo armanc, berjewendî û çarenûsa xwe, xetekê ango bîr û baweriyekê hildibijêre. Ji bo ku armanc û daxwazên wî pêk werin, her tim têdikoşe. Têkoşîn û şoreşa gelê kurd û pêkhateyên din li Bakur û Rojhilatê Sûryeyê, xwedî cihekî girîng e, bi taybetî rizgarkirina herêm, gund û bajarên wan ji destê dewleta desthilatdar a Sûriyeyê û rêxistina terorîst a DAÎŞ`ê.

Ji bilî wê jî avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û kantonan li Bakur û Rojhilatê Sûryeyê, xwedî dengvedan û bandoreke sereke ye.

Ji ber ku her kes vê pêngavê ji nêz ve dişopîne û gelek zanyar û siyasetmedar jî vê pêngavê weke guhartineke bingehîn dibînin û radigihînin ku pêwîst e ev nimûne ji bo tevahiya Sûriyeyê, bibe çavkaniya çareseriyê. Ji ber ku di projeya kantonan de, mafê hemû mirov, ol û pêkhateyan heye û diparêze. Ev proje, wê bibe rêya yekane ya ku Sûriyeyê ji vê rewşa aloz derxîne û bike welatekî demokrat. Helbet ev proje, ji valahiyê nehatiye; bi ked û têkoşîna gelê kurd û gelên din, ji hilbijartina xeta aştî, mirovahî û kurdewariyê, hatiye. Ji bo parastina vê rastiyê jî gelek qurbanî hatin dayîn.

Peyvên ku heyînan didin nasîn, ji wan re **"navdêr"** tê gotin. Mirovan ji bo heyînên zindî û nezindî rêyên kurt hilbijartine û ketine rêyekê ku karibin, her heyînê bi peyvekê bidin nasîn.

Mînak: dar, av, xak, mêş…

Lê belê, her demê navek tenê têra têgihîştina hest, hizir, heyîn, an jî wateyên pêwîst nake. Ji navekî din, alîkarî tê xwestin. Bi peyva **mêş** re peyva **hingiv** tê bikaranîn. Bi vî awayî, daxwaz bi awayekî sergihayî tê nasîn.

Peyvên; **"roniya rokê, kaniya masiyan"** jî ravek in. Bi vî awayî, hatine peydakirin. Peyvên di benda jorîn de, yên ku binê wan hatine xêzkirin, baş hatine şîrovekirin. Dema ku peyvek ji aliyê peyvên din ve tê zelalkirin û şîrovekirin, baş tê naskirin. Ji vê taybetiyê re **"ravek"** tê gotin.

## Cureyên Ravekan:

* Raveka navdêran
* Raveka hevalnavan
* Raveka cînavan
* Raveka hevalkaran

**Têbînî**: Hin ravekên din jî hene, wek raveka rêzîn û ya zincîrîn.

## 1. Ravekên Navdêran:

Di raveka navdêran de, hem raveber, hem raveker jî navdêr in. Raveker, di rewşa tewandî de ye.

### Cureyên raveka navdêran

### Raveka navdêran dibe du beş:

- Raveka navdêran a binavkirî
- Raveka navdêran a nebinavkirî


### a. Raveka navdêran a binavkirî (diyar):

Di raveka navdêran a binavkirî de **veqetandeka binavkirî**, dikeve **navbera raveber û ravekerê**.

Mînak:

- Keç**a** Bêrîvanê, çi delal e!
- Bay**ê** çiyayan, pir sar e.
- Deş**tên** Kurdistanê, pir fireh in.

Dema ku em temaşeyî van ravekên navdêran dikin, dibînin ku di navbera raveber û ravekerê de, **veqetandeka binavkirî** hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê, ev raveka navdêran a binavkirî ye.




## b. Raveka navdêran a nebinavkirî (nediyar):

Di raveka navdêran a nebinavkirî de, **veqetandeka nebinavkirî**, dikeve navbera **raveber û ravekerê**.

Mînak:

- Rêxistina kantonan, rêxistin**eke** civakê ye.
-Heval**ekî** Şepal dîroknas e.
- Dar**ine** cîranan hişk bûne.

Dema ku em temaşeyî mînakên li jor dikin, dibînin ku ravekên navdêran ên binê wan hatine xêzkirin, raveka navdêran a nebinavkirî ne. Ji ber ku veqetandeka nebinavkirî hatiye bikaranîn.

Dema ku em dibêjin **“dara hejîrê”** em têdigihjin ku gelek cureyên daran li wir hene û yek ji wan dara hejîrê ye. Lê dema ku em dibêjin **“dareke hejîrê”** em têdigihêjin ku gelek darên hejîrê li wir hene.

Dar**eke** hejîrê

**Raveber** | **Veqetandeka nebinavkirî** | **Raveker (navekî tewandî ye)**

## HÎNDARÎ


1. Bi peyvên li jêr, şeş ravekên navdêran çêbike:

| Dar | Dibistan |
|---|---|
| Heval | Dest |
| Parêzname | Çiya |
| Gul | Serok |
| Xwendekar | Hinar |
| Demjimêr | Buhar |

## Taybetiyên raveka navdêran:


1. Di hevsergihayîkirina navan de, herî kêm du nav peyda dibin. Peyvên ku ravekê çêdikin, êdî dibin weke qalib û nayên parçekirin.

Mînak 1:




Her weke ji mînaka jor jî hat têgihîştin ku ravek ji sê hêmanan pêk tê: Ya yekem **raveber e** (rave dibe), ya duyem **veqetandek** e û ya sêyem jî **raveker e** (rave dike).

Mînak 2:




**Peyva “berxwedan” bi rêya veqetandekê hatiye ravekirin.**

2. Di raveka navdêran de, dibe ku ji yekê zêdetir raveber an jî raveker hebin.

Mînak:

a. Pirsgirêk, lewazî û kêmasiy**ên** mirovan pir in.


Ji ber ku her tim ziman kurtiyê dixwaze û ravekereke hevpar heye. Peyva mirovan a ku ravekera tevahiyan e, carekê hatiye bikaranîn. Bi vî awayî, axaftin hatiye kurtkirin. Ji ravekera ku pir raveberên wê hene re, **ravekera hevpar** tê gotin.

b. "Di baxçeyê me de, dar**ên** hinar, hejîr, zerdelî (mişmiş), gûz û guhîjan, hene."

Li vir raveber, peyva "dar" e û peyvên "hinar, zerdelî, gûz, guhîj û hejîr" raveker in. Ji ravebera ku pir ravekerên wê hene re, ravebera hevpar tê gotin.

3. Dibe ku raveka navdêran, bibe raveber, an jî ravekera ravekeke din.

Mînak:



## Têbînî

Dema ku veqetandek nekeve, navbera navdêran, nabe raveka navdêran.


"Şivhinar, marmasî, pelmêw" ev birepeyv nabin raveka navdêran; dibin navên hevedudanî.

## 2. Raveka Hevalnavan:

- Mirov**ê** rêzdar tê hezkirin.
- Xwendekar**ên** jîr hatin xelatkirin.


Di hevokên li jor de, hevalnavên "rêzdar, jîr" hene. Van hevalnavan, çawaniya navdêran dane diyarkirin. Ji birepeyvên ku ji navdêr û hevalnavan tên holê re, **raveka hevalnavan** tê gotin.

Mînak:




Di raveka hevalnavan de, raveker **hevalnav** e û raveber **navdêr** e. Ji ber ku hevalnavên çawaniyê natewin, di van ravekan de, ravekerên ku hevalnavên çawaniyê ne, netewiyane.


Mînak:





## Taybetiyên raveka hevalnavan

1. Weke ku li jor tê dîtin, raveber navdêr e û raveker jî hevalnav e.
2. Dibe ku navdêrek ji hevalnavekê zêdetir bigire.

Mînak:



### 3. Raveka cînavan:

Di vê ravekê de, tiştek bi alîkariya cînavan tê ravekirin. Di van ravekan de, cînavên tewandî dibin raveker.

Mînak:

- Gundê wan, pir xweş e.

(**Wan**, raveker e û cînava kesane ya tewandî ye.)

- Destê vî şkestî ye.

(**Vî**, raveker e û cînava şanîdanê ya tewandî ye.)

## Têbînî

Dibe ku raveker ji cureyên din ên cînavan (nebinavkirî, pirsiyarî, jimarîn ...) bin. Ew jî divê bên tewandin.

Mînak:

- Berxwedan**a** **çaran**, bêhempa bû.

**Çaran**, raveker e û cînava jimarîn a tewandî ye.

- Pirtûk**ên** **hinekan**, pir kevn bûn.

**Hinekan**, raveker e û cînava nebinavkirî ya tewandî ye.

- Biray**ê** **kîjanê** bijîşk e?

**Kîjanê**, raveker e û cînava pirsiyariyê ya tewandî ye.

## 4. Raveka Hevalkaran:

Hin hevalkarên cih û berekê, dibin raveker. Dema ku hevalkarên cih dibin raveker, daçek jî dikevin navbera raveber û ravekerê.

Mînak:

Mala li quntara çiya, pir kevnar e. (li quntara çiya, raveker e)

**Hevalkarê cihî ye**

Keçika li jorê, dotmama min e. (li jorê, raveker e)

**Hevalkarê berekî ye**

## Di hevokê de cih û peywera ravekan:

Hêmanên hevokê, carinan ji peyvekê tenê pêk tên û carinan jî çend peyvên di forma ravekê de hêmaneke hevokê pêk tînin. Ew ravek carinan dibe kirde, yan bireser, an jî têrker.

Mînak:

- **Kirde:** "**Hevalên hêja**, nayên jibîrkirin."
- **Bireser:** Min **gotina rast**, got.
- **Têrker:** Bêrîvan, **ji mala hevala xwe** hat.
- **Pêveber:** Rodî, **xwendekarekî jêhatî** ye.

## Raveka zincîrîn:

Dema ku raveber dubare bibe, di hevokekê de raveka zincîrîn pêk tê.

Mînak:

- Gundê mala bavê min, girêdayî Hesekê ye.

Balê bikşîne li ser ravekê, hûn ê bibînin ku çend raveber hene (gund, mal û bav) van raveberan mîna xelekên zincîrê hev girtine.

Raveka zincîrîn dibe ku raveka cînavî, navdêrî yan jî hevalkarî be.

Mînak:

- Mamosteya dibistana me, serkeftî ye.
- Deriyê mala me yê mezin, xweşik e.
- Gotina hevala li rex te, tûj bû.
- Xwişka hevala Mizgînê, hat bajarê me.

**Têbînî**: Raveka zincîrîn bi temamî dibe hêmaneke hevokê, dibe ku bibe kirde, bireser, pêveber an jî têrker.

Mînak:

- Ez ji gundê mala bavê xwe, hez dikin.
- Dîwarê mala me, bilind e.

## Ravekên rêzîn:

Di hevokê de, dema ku bê xwestin ku raveker dubare bibe, raveka rêzîn tê bidestxistin.

Mînak:

- Keça min a biçûk dirêj e.

Balê bikşînin ser vê ravekê, hûn ê bibînin ku **min** û **biçûk** her du jî ravekera peyva keçê ne. Di vê rewşê de raveka rêzîn tê bidestxistin.

Mînak:

- Zîlan kurê xwe yê mezin fêrî ziman dike.
- Ez çûm gundê xwe yê li Efrînê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Ravekê pênase bike.
2. Du hevokan li ser raveka zincîrîn saz bike û hêmanên wan destnîşan bike.
3. Raveka rêzîn çawa tê bidestxistin? Bi mînakekê zelal bike.
4. Cudahiya di navbera raveka navdêran a binavkirî û ya nebinavkirî de, çi ye?
5. Raveka hevalnavan, bi mînakan şîrove bike.
6. Bi peyvên li jêr, ravekê pêk bîne:

**(Bira - Nexweş - Mezin - Bajar - Ketin - Li)**

Wane 3

# HEVALNAV

**Hevalnav:** Ew curepeyv in ku hevaltiya navan dikin.

## Hevalnav li gorî peyvsaziya wan:

### 1. Hevalnavên xwerû:

Mînak:

- Dirêj, kin, qelew, mezin ...

### 2. Hehalnavên nexwerû:

a. Pêkhatî: maldar, nexweş, bêhiş …

b. Hevedudanî: çavreş, bejinbilind, porsor …

## Cureyên hevalnavan: Pênc cureyên hevalnavan hene, ew jî ev in:

1. Hevalnavên çawaniyê.
2. Hevalnavên şanîdanê.
3. Hevalnavên nebinavkirî.
4. Hevalnavên jimarîn.
5. Hevalnavên pirsiyariyê.

### 1. Hevalnavên çawaniyê:

Ew curehevalnav, çawaniya navdêran nîşan dide û bi pirsa **"çawa"**yê ya ku ji navdêran tê kirin, tê bidestxistin.

Mînak:

- Xwendekara **jêhatî** bi ser ket.
- Xwendekara **çawa** bi ser ket?

Hevalnava çawaniyê yan dibe ravek, yan jî dibe beşek ji pêveberê.

Mînak:

- Dibistana **mezin** li Qamişloyê ye. (ravek)
- Mamosteyê me **jîr** e. (pêveber)

## 2. Hevalnavên şanîdanê:

Dema ku navdêr piştî cînavên şanîdanê tên, ew cînav hevaltiya wan navdêran dikin û dibin hevalnavên şanîdanê.

Mînak:

- **Ev zêrevan** bi peywira xwe radibe.
- **Vî dergevanî**, bi rûkenî mêvan pêşwazî kirin.
- **Ew hêviyên** min pêk hatin.

Hevalnavên şanîdanê yên tewandî, navdêrên piştî xwe ditewînin.

Mînak:

- **Vî mamosteyî** bi dilsozî kar kir.
- **Vê keçê** karê xwe zû qedand.
- **Wan xwendekaran** lêkolînek amade kir.

**Pirsa hevalnavên şanîdanê bi "kîjan"ê tê kirin.**

## 3. Hevalnavên nebinavkirî:

Dema ku navdêr piştî cînavên nebinavkirî tên, ew cînav hevaltiya wan navdêran dikin û dibin hevalnavên nebinavkirî.

Mînak:

- **Gelek** kar hatin kirin.
- **Hin** mirov, bêyî welatê xwe nikarin bijîn.

**Pirsa hevalnavên nebinavkirî bi "çi qas"yê tê kirin.**

Mînak:

- Min **hinek mamoste** li goristana şehîdan dîtin.
- Te **çi qas mamoste** li goristana şehîdan dîtin?

### 4. Hevalnavên jimarîn:

Dema ku jimarnav hevaltiya navdêran dikin, dibin hevalnavên jimarîn.

Mînak:

- Ciwanan li ber dibistanê **bîst dar** çandin.
- **Deh zarok** ji dibistanê dûr ketin.

**Pirsa hevalnavên jimarîn bi (çend) tên kirin.**

### 5. Hevalnavên pirsiyarî:

Ew hevalnav tên ber navdêran û pirsa hevalnavên din dikin.

**"Çawa":** Pirsa hevalnava çawaniyê dike.

Mînak:

- Keç dirêj e. (hevalnava çawaniyê)
- Keç çawa ye? (hevalnava pirsiyarî)

**"Kîjan":** Pirsa hevalnava şanîdanê dike.

- Ev şagirt serkeftî ye.
- Kîjan şagirt serkeftî ye?

**"Çi qas":** Pirsa hevalnava nebinavkirî dike.

- Gelek mirov çûn Saziya Malbatên Şehîdan.
- Çi qas mirov çûn Saziya Malbatên Şehîdan?

**"Çend":** Pirsa hevalnavên jimarîn dike.

- Bavê min sê pirtûk ji min re anîn.
- Bavê min çend pirtûk ji min re anîn?

**Têbînî:** Hevalnav û navdêrên piştî xwe, dibin hêmaneke hevokê.

- Çar xwendekar, di pêşbirkê de bi ser ketin.

**Têbînî:** Neyîniya hevalnavan bi pêveka “**ne**”yê pêk tê û cuda tê nivîsîn, lê dema ku pêveka “**ne**”yê bi hevalnavan vedibe, hevalnavekî nû çêdike.

Mînak:

- Ev şerbet **ne xweş e**. (neyînî)
- Kurê min **nexweş e**. (hevalnav)

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hevalnav çi ne?
2. Du hevokên ku hevalnavên hevedudanî di nava xwe dihundirînin, binivîsîne.
3. Cureyên hevalnavan rêz bike û bi mînakan wan têr bike.
4. Cureyên hevalnavên di hevokên li jêr de, diyar bike:

- Gundên berav, xweş in.
- Ev stranbêj, dengê wî xweş e.
- Pir kes hatine mala me.

Wane 4

# HEVALKAR

Hevalkar: Ew curepeyv in ku hevaltiya lêkeran dikin.

Dema ku em dibêjin **“keça min xweşik e.”** Em dibînin ku peyva (**xweşik**) rengê keçê diyar dike, lewre di vê mînakê de peyva (**xweşik**) **hevalnav** e.

Lê belê, dema ku em bibêjin **“keça min, xweşik diaxive”**, di vê hevokê de (**xweşik**) hevaltiya lêkerê dike, lewra **hevalkar** e.

**Hevalkar li gor peyvsaziya xwe dibin du beş:**

**1. Hevalkarên xwerû:**

Mînak:

- **dereng, zû, hêdî, bilind, paş, pêş, nizim ...**

**2. Hevalkarên nexwerû:**

Mînak:

- **îro, îşev, hêdîka, wisa, weha ...**

**Têbînî:** Di hevalkarên nexwerû de, pêvekên **“bi-, bê-, ne- ...”** cuda tên nivîsîn.

Mînak:

- Kurê min **bê** hêz kar dike.
- Saziya me, **bi** rêkûpêk dixebite.
- Ew karker, **ne** xweşik kar dike.

## Cureyên Hevalkaran:

1. Hevalkarên çawaniyê.
2. Hevalkarên çendaniyê.
3. Hevalkarên demê.
4. Hevalkarên cih û bereke.
5. Hevalkarên pirsyariyê.

### 1. Hevalkarên çawaniyê:

Ew curehevalkar çawaniya lêkerê, nîşan didin.

Mînak: zû, dereng, hêdî, rasterast, bi nezanî ...

- Birayê min, **mîna şêran** li ber xwe da.
- Hevalê wan **bi lez** ji vir dûr ket.
- Em **bi derengî** çûn kar.

### 2. Hevalkarên çendaniyê:

Ev curehevalkar, mêjer û radeya karê ku tê kirin nîşan didin, lê di vir de, tiştekî ji sedî sed tune ye.

Mînak: kêm, zêde, pir, gelekî ...

- **Zêde** nede ber dasê, wê bimîne asê.
- **Pir** bihizire, kêm biaxive.

### 3. Hevalkarên demê:

Ev curehevalkar, dema kirina kar nîşan didin.

Hin hevalkarên demê: duh, îro, nîvro, sibehê, pêr, îsal ...

Mînak:

- **Duh** hevalê min hat vir.
- **Roj bi roj** doz geştir dibe.
- Ew ê **îşev** werin mala me.

## 4. Hevalkarên cih û berekê:

Ev curehevalkar, cih û bergeha karê ku tê kirin nîşan didin.
Hin hevalkarên cih û berekê: hundir, bi ser de, bi pêş de ...
Her weha hemû navên cihan, li gel daçekan dikarin bibin hevalkarên cih.

Mînak:

- Ez **li Serê Kaniyê** me.
- Mamoste **ji dibistanê** tê.
- Tu hatî **nêzîkî** min.

## 5. Hevalkarên pirsiyariyê:

Ev curehevalkar, pirsa hevalkarên din dikin.
Hevalkarên pirsyarî: çawa, kengî, bi ku ve, li ku ...

Mînak:

- Ew karê xwe bi rêkûpêk dike.
- Ew **çawa** karê xwe dike?

### PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hevalkar, çi ne û çima ev nav li wan hatiye kirin?
2. Ji her cureyekî hevalkaran re, mînakekê binivîsîne.
3. Hevalkarên nexwerû, çawa tên nivîsîn? Bi mînakan zelal bike.

# DAÇEK

## ÇÛKÊ BEDEW

**Çûkek hatî ji banî**
**Li ser dara me danî**
**Çi rengîn û bedew bû**
**Xwendî bi çil zimanî**
**Awazê wî çi xweş bûn**
**Çendî li hevdu tanî**
**Ji gewriya wî ya naz**
**Diherrkî b` rewanî**
**Bi fîxan û xulxul bû**
**Jiyan dikir nîşanî**
**Ez xweş lê bûme guhdar**
**Tiştek mi jê hilanî**

**Salihê Heydo**

Di helbesta li jor de, peyvên " ji, li, bi" ne xwedî wate ne; ew peyv, erkî ne.

Gelo em dikarin çi navî li wan bikin?

**Daçek:** Ew curepeyv in ku ne xwedî wate ne; lê ew erkdar in.

**Daçek dibin du cure:**

1. Daçekên xwerû
2. Daçekên hevedudanî

## A. Daçekên xwerû ev in:

**Ji, Di, Bi, Li**

### 1. Daçeka "Bi"

Mînak:

- Av bi bêjingê, nayê civandin.
- Ez bi wan re, giham Efrînê.
- Ew pisîk bi darê ve, hilawestiyayî ye.
- Kuro! Bi wê derê de, neçe.

### 2. Daçeka "Ji"

- Baran ji ewrên reş tê, kar ji dilê xweş tê.
- Ew ji hêla bakur ve, tê.
- Hesp ji duh ve, di axur de ye.
- Min ji apê xwe re got.

### 3. Daçeka "Di"

- Masî di avê de nayê, bazarkirin.
- Pez di xaçirêkan re, derbas bû.
- Ew hêştir di wî dergehî re, derbas nabe.

### 4. Daçeka "Li"

- Li dirûvê mirov nenêrin; reftar kesayeta mirov diyar dikin.
- Min li zanîngehê, waneyên cur bi cur standine.

**Têbînî:** Daçeka "li", paşdaçeka wê tune ye.

## B. Daçekên Hevedûdanî:

Ew daçek, bi alîkariya daçekeke xwerû û pêjeyekê tên bidestxistin.

Mînak:

- **Li ser** vê şopê, gihaşt armanca xwe.
- **Li dor** xwe negere, bila çavên te li wan be.
- **Li pey** tengasiyan, firehî ye.
- **Ji derdora** xwe bipirse; dilnizmî sincekî baş e.
- **Ji aliyê** wî ve, pêşinyar hat dayîn.
- **Bi pey** nezanan nekeve; tu rêya wan ronî bike.
- Ew **bi bin** neket; wî asta xwe nas kir.

### LÊKOLÎN

Wekî di waneya me de derbas bû, ji bilî daçeka "Li"yê, ji-her daçekekê re paşdaçekek heye, derbarê daçekan de, lêkolîn bike.

Wane 6

# GIHANEK

**Gihanek:** Ew peyvên ku bi tena serê xwe ne xwedî wate ne, lê peyvan an hevokan bi hev ve girê didin û têkiliyekê di navbera wan de saz dikin.

## 1. Gihanekên girêdanê:

Girêdanekê di navbera hevokan de saz dikin û diyar dikin ku tiştekî hevbeş yan hemdem di navbera wan de , heye. Mîna: ku, her weha, her wekî, jî, û, hem … hem, …

Mînak:

- Ez li te guhdar dikim ku ji te fêr bibim.
- Ew lîstikvanê goga pêyan e, her weha bi goga zembîlê jî dilîze.
- Her wekî tê zanîn, av jiyan e.
- Hem dixwe, hem diaxive.

## 2. Gihanekên nakokî û dijberiyê:

Dikevin navbera hevokên ku dijberî an jî cudahî di navbera wan de heye.

Mîna: lê, tevî ku, lê belê, …

Mînak:

- Em hatin serdana we, lê hûn ne li malê bûn.
- Tevî ku werziş bi sûd e, yên ku werzişê dikin kêm in.
- Kêfa min ji gundan re tê, lê belê ez li bajar dijîm.

## 3. Gihanekên sedemî:

Dikevin navbera hevokên ku sedem û encam di wan de hebin. Mîna: ji ber vê yekê, ji ber ku, lewre, lewma, çiku, çer ku, çima ku …

Mînak:

- Min lez kiriye, ji ber vê yekê (lewre) ez tî bûme.
- Ji ber ku baran pir bariya, îsal berhema çandiniyê baş bû.
- Çer ku min rastî got, dilê xwe ji min girt.

### 4. Gihanekên demî:

Du hevokên ku têkiliyek ji aliyê demê ve di navbera wan de heye, bi hev ve girê dide. Mîna: berî ku, piştî ku, dema ku, gava ku, heta ku, …

Mînak:

- Berî ku tu biçî, rêya xwe bi min bixîne.
- Gava ku (dema ku) ez feqîr bûm, te guh nedida min.
- Piştî ku berf heliya, rûyê erdê da der.

### 5. Gihanekên mercî:

Hevokên ku merc di wan de hebe, bi hev ve girê didin. Mîna: ku, heke, heger, her çiqas … ewqas, …

Mînak:

- Ku tu bixwînî, tu yê bi ser bikevî.
- Heke em nebin yek, em nagihêjin azadiya xwe.
- Her çiqas tu xwedî sinc bî, ewqas tu yê bê hezkirin.

### 6. Gihanekên bijarker:

Dikeve navbera du hevokên bijarker, ji bo hilbijartina tiştekî tê bikaranînMîna: an, an…an, …

Mînak:

- Roja înê y**an** şemiyê, ez ê serdana te bikim.
- Azadîxwazan soz da, **an** serkefin **an** serkeftin.

### 7. Gihanekên hemwateyî:

Du hevokên ku hemwate bin an jî ji aliyê wateyê ve pir nêzî hev bin, bi hev ve girê didin. Mîna: ango, anku, dêmek, …

Mînak:

- Ez her dem bi te re bûm; ango min alîkariya te dikir.
- Tu di bûyerê de bû, dêmek tu agahiyan dizanî.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Gihanek, çi bi hev ve girê didin?
2. Beşên gihanekan rêz bike û ji her yekê re mînkekê binivîse.
3. Hevokên li jêr, bi rêya gihanekê bigihîne hev:

- Ez li televîzyonê temaşe dikim ............ şîvê dixwim.
- Ew ji xwendina pirtûkan hez dike ............. şano bala wî dikêşe.
- Ev deh sal, li derveyî welat dijî .......... wî bêriya welatê xwe kiriye.
- ............. em li tenduristiya xwe miqate bin, em nexweş nakevin.

# BEŞA SÊYEM

## Hêmanên Hevokê

## HÊMANÊN HEVOKÊ

**Di hevokê de, du hêmanên bingehîn hene, ew jî ‘’kirde û pêveber” in. Her weha du hêmanên alîkar jî hene, ew jî ‘’bireser û têrker” in.**

Ji ber ku hevok di kurdî de, bê pêveber nabe, di destpêkê de, em ê pêveberê şîrove bikin.

### 1. Pêveber:

Ew hêmana ku di nava hevokê de karekî, bûyerekê, yan jî rewşekê radigihîne.

Pêveber pirê caran lêker e, lê hin caran bi alîkariya lêkera bûnê dibe navdêr, hevalnav, ravek, cînav, baneşan, daçek gihanek û hevalkar jî.

Mînak:

- Derî vebû. ( lêker )
- Ew dirêj e. ( hevalnav )
- Amed li malê ye. ( hevalkar )
- Şêrîn hevala min e. ( ravek )

Pêveber di hevokên tebatî de, ji lêkera alîkar û ya bingehîn pêk tê.

Mînak:

- Cil hatin şûştin.

Pêveber di hevoka dema bê de, ji amraza demê û lêkerê pêk tê.

Mînak:

- Delal dê biçe.
- Di buharê de, em dê gulan biçînin.

Cihê pêveberê, pirê caran li dawiya hevokê ye, lê carinan di nava hevokê de jî cih digire.

Mînak:

- Ez dikarim bihizirim.
- Ew her şev diçin mala xizmên xwe.
- Mêşên hingiv ketine kewaran.

**Pirsa hemû hêmanên din ji pêveberê tê kirin.**

Mînak:

- Serhed qeymaxê gamêşan xwar.
- Kê xwar? Serhed (Kirde)
- Çi xwar? Qeymaxê gamêşan (bireser)

## 2. Kirde:

Ew kes an jî tiştê ku kar, tevger û kirinekê pêk tîne.

Dema ku ji pêveberê pirsên ( kî, kê û çi) bên kirin, kirde bi dest dikeve.

**kî, kê ji bo mirovan, çi jî ji bo heyberan e.**

Mînak:

- Şervan berê xwe da cengê.
- Kê berê xwe da cengê?

**Bersiv: Şervan**

- Kevir ket.
- Çi ket.?

**Bersiv: Kevir**

**Têbînî:** Di hevokên navdêrî de, ji ber ku lêkera "**bûnê**" li gel me heye, di van hevokan de, kirde her dimîne kirde.

Mînak:

- Zinar şagirt e.

**“Carnan kirde veşartî ye û bi alîkariya qertafên kesane, xwe nîşan dide.”**

Mînak:

- Diçim mala bavê xwe.

Di vê mînakê de, qertafa kesane (**im**), kirdeyê bi me dide naskirin (**ez**).

**Têbînî:** Ji ber ku di kurdî de, qertafên kesane, di her sê kesên pirjimar de jî (**in, ne**) ne, di pirjimariyê de, mirov nikare bêyî cînavên kesane (**em, hûn, ew**), kesan ji hev veqetîne, lewre jî kirdeya veşartî pêk nayê.

**Hin curepeyvên ku cihê kirdeyê digirin.**

1. **Navdêr:**
   - Hogir mamoste ye.
2. **Cînav:**
   - Ez çûm zanîngehê.
3. **Ravek:**
   - Bavê Zînê maldar e.
4. **Kurtehevok:**
   - Birayê min ê ku li Şamê bû, îro tê gund.

Di avaniya tebatî de, kirde ne diyar e, bireser di vê rewşê de dikeve şûna kirdeyê.

Mînak:

- Mal hat paqijkirin.
- Werîs hat şewtandin.

**Mal û werîs** di her du hevokan de, bireser in, lê ketine cihê kirdeyê.

**Cihê kirdeyê li gorî hevoksaziyê li destpêka hevokê ye.**

Mînak:

- Şoreş, Romana Şivanê Kurmênc dixwîne.

**Têkiliya di navbera kirde û pêvebrê de:**

a. Di dema niha, bê û rawayên daxwaziyê de, pêveber qertafên kirdeyê digire.

Mînak:

- Tu jiyana me ronî dikî. (dem niha)
- Ew dê di zanîngehê de bixebite. (dema bê)
- Ew dixwaze di pêşerojê de, bibe bijîşk. (raweya daxwazî)

b. Dema ku kirde komenav be, pêveber yekjimar tê bikaranîn.

Mînak:

- Gel li ser pêyan bû.
- Kerî diçe ser avê.

c. Dema ku kirde hevenav be, pêveber dibe ku yekjimar be yan jî pirjimar be.

Mînak:

- Mamoste pirtûka ziman dixwîne. (yekjimar)
- Mamoste pirtûka ziman dixwînin. (pirjimar)

**3. Bireser:**

Ew kes an jî tiştê ku bandora karê ku tê kirin li wî/ê dibe.

Mînak:

- Zîlanê lênûs kirî.
- Edîson, lempeya elektrîkî afirand.

**"Lêkerên gerguhêz xwedî bireser in."**

Mînak:

- Gelên herêmê azadî bi çavên xwe dît.
- Şivan pez çêrand.

**Bireser dibin du cure:**

a. Biresera rasterast:

Mînak:

- Memo, diravên hevalê xwe, vegerandin.

b. Biresera nerasterast:

Mînak:

- Hogir bi gogê dilîze.
- Şahîn li lîstikvanan temaşe dike.

**Têbînî:** Bireserê nerasterast, piştî daçekan tê.

**Têkiliya di navbera bireser û pêveberê de:**

Di demên borî de, bi lêkerên gerguhêz re, bireserên rasterast nayên tewandin (cihên cînavên xwerû digirin), lewra pêveber; ango lêker, li gorî bireserê tê kêşan.

Mînak:

- Hemrînê Nisrîn dîtiye. (bireserê rasterast)
- Zarokan, gelek hevkêşeyên bîrkariyê çare kirin.

Di demên borî de, bi lêkerên gerguhêz re, heger biresera me, nerasterast be; çiqasî pirjimar be jî lêker yekjimar tê kêşan.

Mînak:

- Min ji zarokan hez kir.
- Me bi gelek kesan re, danûstandin kir.

Di demên borî de, (lêkera gerguhêz) heger biresera me cînavên "xwe û hev" bin, lêker, yekjimar tê kêşan.

Mînak:

- Me xwe fêr kir.
- Me hev nas kir.

**Hin curepeyvên ku dibin bireser:**

**1. Navdêr:**

Mînak:

- Min Memo nas kir.

**2. Cînav:**

Mînak:

- Bavê min ew xwedî kir.

**3. Ravek:**

Mînak:

- Ez her roj xwişka xwe fêrî zimanê kurdî dikim.

**Cihê bireserê:** Wekî ku em dizanin cihê bireserê di nava hevokê de ye, lê carinan dikeve dawiya hevokê.

Mînak:

- Welat av da Şalyar.

(Av, bireserê rasterast e)

(Şalyar, bireserê nerasterast e)

**4. Têrker:**

Têrker ji gelek aliyan ve, karê ku tê kirin sergihayî dike. Ev sergihayîkirin dibe ku ji aliyê dem, cih an jî rewşê ve be, lewra em dikarin bibêjin ku têrker, di bingeha xwe de, hevalkar û daçek in. Ji bo bidestxistina têrkeran, pirsên mîna (kengî, li ku, bi ku de, ji çi, çawa û hwd) ji pêveberê tên kirin.

Mînak:

- Zîlan beriya nîv saetê, çû Dirbêsiyê.

Kî çû? Zîlan (kirde)

Kengî çû? Beriya nîv saetê. (têrker e; hevalkara demê ye)

Bi ku de çû? Dirbêsiyê (têrker e; hevalkara cihî ye)

Mirov dikare bibêje, her tiştê ku hevokê têr bike, dikare bibe têrker.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çend hêmanên hevokê hene? Bi mînakan şîrove bike.

2. Di malika li jêr de, binê lêkeran xêz bike:

**Gul heye em dizanin**
**Hem rind in hem ciwan in**
**Bi Xwedê, ne erzan in**
**Ji bo wê ketim xewê de**

3. Hêmanên van hevokan destnîşan bikin.

a. Gula sor û çilmisî, li deşta bêav şîn dibe.
b. Hevalê me, di daristanê de xefkên xwe vedide.
c. Tu kengî di pêşbirkê de, bi ser ketî?
d. Min di refê de pirtûk xwend.
e. Ji bilî zanînê, tiştê baştir sinc e.

# BEŞA ÇAREM

## Cureyên Hevokan

# CUREYÊN HEVOKÊ

Dema ku hûn diaxivin an jî dinivîsin, hûn balê dikişînin ka lêkerên hevokan ji kîjan cureya lêkerê, yan jî pêveberê ne. Dema ku hûn bûyerekê radigihînin, an jî wateya wê sergihayî dikin, hûn kîjan peyvê di sazkirina wê hevoka xwe de, bi kar tînin; nav e yan lêker e?

Balê bikişînin ser lêkerên di benda li jêr de ku nivîskar çawa lêker bi kar aniye?

**"Zinarek li hemberî min bû dayê. Min xwe bi wî zinarî ve girt. Ez reviyam! Min çend gav neavêtibûn, li paş min dengekî zelal û şîrîn, hat bihîstin. Wî dengî ji min re got: "Leşker! Tu bi ku ve direvî; ma ji mirinê rev heye?!"**

Di vê benda li jor de, şeş hevok hene. Dema ku em temaşeyî lêkerên van hevokan dikin, têdigihêjin ku du cure hevok hatine bikaranîn.

**Li gorî cureya lêker û rewşan, hevok dibin du beş:**

1. Hevoka navdêrî
2. Hevoka lêkerî

**Hevok:** Ji peyv an jî birepeyvên ku hest, raman, daxwaz, nûçe û bûyerekê tê digihînin re, **hevok** tê gotin; an jî dema ku çend bêje li gorî rêz û rêzikekê li pey hev, rêz bibin û wateyekê bidin, ji vê koma bêjeyan re, **hevok** tê gotin.

## Hevok li gorî rewşa pêveberê

### A. Hevoka navdêrî:

Dema ku pêveber ji navdêr, hevalnav, hevalkar an cînav û lêkera bûnê ya ku rewşê dide xuyakirin saz bibe, **hevoka navdêrî** derdikeve holê.

Mînak:

- Ew dengê xweş ê kewê ye.
- Aram û Hevend hevalên min in.
- Awazên bilbil pir xweş in.
- Raman jêhatî ye.
- Ew gotin ne zelal e.
- Em hevalên hev bûn.

## B. Hevoka lêkerî:

Peyvên weke: girt, reviyam, bihîstin, got û direve yên ku di benda li jor de, derbas bûne, **lêker** in.

Ev cureya lêkeran, kirina karekî diyar dikin. Dema ku pêveber ji lêkerekê pêk bê; ango hevok li ser lêkerê bê avakirin, jê re **hevoka lêkerî** tê gotin.

Mînak:

- Hogir, xwe nexapîne, em ê li jor kar berdewam bikin.
- Mizgînî ji nişka ve tê.
- Divê wekhevî di navbera jin û mêr de, bê avakirin.

Dema ku em lêkerên di mînakên li jor de, lêkolîn dikin, dibînin ku kirina karekî diyar dikin. Ji ber vê yekê, em têdigihêjin ku ev hevok, lêkerî ne.

## Hevok li gorî wateyê

Hevok li gorî wateyên xwe; ango peyamên ku ji wan derdikevin, bi vî awayî tên dabeşkirin:

- Hevoka erênî
- Hevoka neyînî
- Hevoka pirsiyarî
- Hevoka ragihandinî
- Hevoka fermanî

- Hevoka navberî
- Hevoka baneşanî
- Hevoka xwestekî

## 1. Hevoka erênî:

Dema ku lêker pêkanîna karekî bûye, yan tê kirin, an jî dê were kirin, ragihîne, yan jî pêveber heyîna tiştekî ragihîne, jê re **hevoka erênî**, tê gotin.

Mînak:

- Ava Zapê xweş diherike.
- Jiyan li herêmên cemserî, pir dijwar e.
- Şaredariya Dêrikê çend gulistan vekirin.
- Em ê di pêşerojê de, ji bo parastina xwezayê, çend zagonan deynin.

## 2. Hevoka neyînî:

Ev curehevok diyar dikin ku pêveber di rewşeke neyînî de ye; ango karê ku lêker radigihîne, nehatiye kirin, nayê kirin û dê neyê kirin. Ev hevok, bi alîkariya qertafên neyîniyê (ne-, ni-, na-) saz dibin.

Mînak:

- Ez neketim pêşbirka bezê.
- Ciwan rastiyê nabîne.
- Vîna gelên aştîxwaz, dê tu carî neyê şikandin.
- Çivîk, ne li ser darê ne.
- Jin ne kole bûn, ne kole ne û dê nebin kole.
- Ez nikarim rastiyê veşêrim.

## 3. Hevokên pirsiyarî:

Ev curehevok bi rêya pirsê, dixwaze agahiyan wergire, da ku gumanan ji holê rake. Di van hevokan de, her dem pirsek heye. Ji ber vê yekê jî divê li hemberî her yekê bersivek hebe.

Dema ku cînav, hevalnav û hevalkarên pirsê tune bin, ev hevok bi alîkariya kirpandinê tên sazkirin. Kirpandina biguman li ser kîjan peyvê be, tiştê ku tê pirsîn ew e. Ji bo xurtkirina gumanbariyê, daçekên weke: **"gelo, ma, qey"** jî tên bikaranîn.

**Li dawiya hevokên pirsiyarî, her dem nîşana pirsê (?) tê bikaranîn.**

Mînak:

- Tu çi dikî?
- Kîjan xwendekarê, wêne saz kiriye?
- Gelo tîma Barcelonayê, yan Realê, lîstik qezenc kiriye?
- Dar hatin çandin?
- Gulnazê hevalên xwe dîtin?

### 4. Hevoka ragihandinî:

Hevokên ku di derbarê rewş û tevgerekê de, agahî û ramanekê bi rêya ragihandinê nîşan didin, ji wan re **hevokên ragihandinî**, tê gotin.

Mînak:

- Beriya du rojan li vê taxê, agir bi sê malan ket.
- Ez ê sibe ji hevalên xwe re, şahiyekê li dar bixim.

### 5. Hevoka fermanî:

Di van hevokan de fermanek heye, ji yekî/ê; yan jî ji hinan pêkanîna karekî, tê xwestin.

Mînak:

- Beriya ku tu xwarinê bixwî, destên xwe bişo.
- Tiştên ku min ji te re gotin, ji kesî re nebêje.

## 6. Hevoka navberî:

Ew hevokên biçûk ên ku dikevin navbera hevokên dirêj, da ku mijarê baştir rave bikin û peyama wê zelaltir bikin.
Dema ku ev hevok, ji nava hevoka mezin bê derxistin, wateya hevokê nayê guhertin.

Mînak:

- Ehmedê Xanî, <u>Xweda wî bi buhişta xwe şad bike</u>, bingeha hişmendiya neteweyî ava kir.
- Ez ê îsal, <u>heke derfet hebe</u>, biçim Amedê.

## 7. Hevoka baneşanî:

Ev curehevok, hestên mirov ên gur û germ didin der. Ev hest dibe ku gir û kîn, kêfxweşî, xiroş, tirs ...
Hin peyv di binyata xwe de baneşan in, mîna: ax, wax, hey!, lo, hey wax, of …

Mînak:

- Kurdo rabe! Êdî bes e bindestî!
- Hey felekê, çima te li me wisa kir?!
- Ax! Ev buhar çi qas geş e.

## 8. Hevoka xwestekî:

Ev hevok wateyên xwestek, daxwaz, merc, divêtî û bilaniyê didin. Ev hevok, bi alîkariya peyvên raweya xwestekî û daxwaziyê, tên sazkirin.

Mînak:

- Xwezî te jî gotina xwe bigota.
- Divê em tu carî karê sexte nepejirînin.
- Bila ez ji destê wan rizgar bibim, ez tiştekî din naxwazim.
- Heke hûn ê bimeşin, zû rabin.

## Hevok li gorî sazbûnê

Hevok li gorî sazbûna xwe, dibin du beş:

### 1. Hevokên xwerû:

Hevokên ku hest û ramanekê tenê rave dikin û bi lêkerekê tenê yê kişandî tên sazkirin, **hevokên xwerû** ne.

Mînak:

- Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, di 19`ê Tîrmeha sala 2012’an de, dest pê kir.
- Divê her kes ji bo rastiyê têbikoşe.

**Têbînî:** Hevokên ku bi alîkariya lêkerên alîkar saz dibin jî hevokên xwerû ne, ji ber ku lêkera alîkar, lêkera bingehîn sergihayî dike.

Mînak:

- Ez diwêrim rastiyê bibêjim.
- Ew dixwazin daran biçînin.

### 2. Hevokên hevedudanî:

Dema ku mirov nikaribe hest û ramanên xwe bi hevokekê tenê vebêje, wê demê dikare hest û ramanên xwe bi çend hevokan, vebêje. Ev hevok, dibe ku hevokên serbixwe bin û bi gihanekan, li pey hev rêz bibin.

Mînak:

- Ez nikarim vê avê vexwim, ev av hinekî qirêj e.
- Berf dibariya, erd hêdî hêdî spî dibû, av diqerisî û zarokên gund bûka berfê çêdikir.

Di **hevoka mînaka destpêkê** de, du hevok hene. Hevoka yekem “ez nikarim vê avê vexwim”, hevoka duyem “ev av hinekî qirêj e.” **Di mînaka duyem** de, çar hevok hene. Hevoka yekem “berf dibariya”, hevoka duyem “erd hêdî hêdî spî dibû”, hevoka sêyem “av diqerisî”, hevoka çarem “zarokên gund bûka berfê çêdikir.”

Her weke ji mînakên jor jî tê têgihîştin, dema ku mirov nikaribe hest û ramanên xwe bi hevokekê tenê vebêje, wê demê çend hevokan bi rêya bêhnok û gihanekan li pey hev rêz dike. Ji wan hevokên lipeyhevrêzkirî re, **hevokên hevedudanî** tê gotin.

**Hevokên hevedudanî di nava xwe de dibin du beş:**

1. Hevokên hevedudanî yên serbixwe
2. Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî

**1. Hevokên hevedudanî yên serbixwe:**

Dema ku hevok ji çend beşan pêk tên, her yek ji wan xwedî wateyeke serbixwe ye û bi alîkariya bêhnok û gihanekan bi hev ve tên girêdan, ji wan re **hevokên hevedudanî yên serbixwe** tê gotin.

Mînak:

- Gelê kurd hişyar bûye, herêmên xwe parastine û Rêveberiya Xweser ragihandiye.
- Zozanê name dixwend û keça wê li televîzyonê temaşe dikir û Serheng li odeya din, li tembûrê dida.
- Min "Romana Bîra Qederê" xwend, ew roman pir xweş bû û bala min kişand.

Her weke ji mînakên jor jî tê naskirin ku di her hevokê de, sê raman hene. Ev raman, bi rêya bêhnok û gihanekan li pey hev rêz bûne da ku hest û raman baş bên ravekirin.

**2. Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî:**

Ev curehevok, ji aliyê wateyê ve bi alîkariya hin gihanekan bi hev ve tên girêdan. Hin gihanekên ku ji bo pêkanîna van hevokan tên bikaranîn, ev in: "lê, lê belê, hem ... hem jî, ne ... ne jî, yan ... yan jî, belkî, dibe ku, her wekî, ku." Ji bilî van, gihanekên sedemî weke: "ji ber ku, da ku, çima ku", gihanekên demê weke: "dema ku, piştî ku, beriya ku" û amrazên raweyê weke: "divê, bila, heke."

Mînak:

- Heke serma wisa bimîne, dê berf bibare.
- Ji ber ku ez pir westiyabûm, ez zû raketim.
- Ez ji dîrokê pir hez dikim, lê belê wêjeya kurdî jî bala min dikişîne.
- Bila dil bi dil be; bila tûrê parsê li mil be.

**Têbînî:** Di hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de, hêmaneke bingehîn û yek alîkar heye.

Mînak:

<u>Ji ber ku tu nehatî</u>, <u>bavê min destûra çûna min neda</u>.

Hevoka alîkar Hevoka bingehîn

**Hevok li gorî cihê pêveberê:**

Di hevokê de, yek ji cudahiyên mezin ên di navbera zimanê axaftin û nivîsê de, hatina lêkerê di cihên cuda de ye.

Di zimanê axaftinê de, bi awayekî giştî, hêmanên hevokê bi taybetî lêker, dibe ku ne di cihê xwe de be.

Mînak:

- Dixwend pirtûka xwe.
- Dikuje hêviyên xwe ew.
- Rakir ala welatê xwe li çiyê.

Bi hevokên weha, em dikarin biaxivin, lê zimanê nivîsê, zêdetir girêdayî destûrên rêzimanî ye.

Piranî, lêker li dawiya hevokê tê bikaranîn. Dema ku lêker li dawiya hevokê be, wateyê diguhere? Li van mînakên li jor binêrin û hewl bidin ku hûn fêr bibin.

Niha jî vê mijara li jêr bixwînin û temaşe bikin ka lêker li ku dera hevokê hatiye bikaranîn.

**“Hatim îro ez ji dibistanê, hatibû girtin rêya me bi daran. Ji bo derbas bibin me banî beldozerê kir. Bi alîkariya derdorê, me rê paqij kir. Piştî wê em derbas bûn. Bi rê ve çûn heta gihaştin şaredariyê. Tirimbêlek hat li rex me rawestiya, em li tirimbêlê siwar bûn, hatin mal û bi vî awayî rêwîtiya me dawî lê hat.”** Dema ku em temaşeyî benda li jor dikin, dibînin ku di mijara destpêkê de hevoka yekem û duyem lêkerên wan ketine destpêka hevokan. Di hin hevokên dawiyê de, lêker ketiye nava hevokê. Bi vî awayî em têdigihêjin ku li gorî cihê lêkeran, hevok dibin du beş:

1. Hevoka ku lêker an jî pêveber dikevin dawiya wê, lê dema ku di hevokê de têrker hebe, dibe ku li pişt lêker an pêveberê bê bikaranîn. Ji vê hevokê re **hevoka bidestûr (birist)** tê gotin.
2. Hevokên ku lêkerên wan dikevin destpêka hevokê yan jî dema bireser li destpêkê û kirde di nav de tê, jê re **hevokên bêdestûr (bêrist)** tê gotin.

**Têbînî:** Carinan lêkera hevoka bidestûr (bi taybetî, dema ku lêkera “hat û çû” tê bikaranîn) dikeve nava hevokê.

## a. Hevoka bidestûr (birist):

Li gorî zimanê kurdî, bi awayê giştî hêmanên alîkar (hoker) dikevin destpêka hevokê û hêmanên bingehîn (pêveber) dikevin dawiya hevokê. Ji ber vê yekê, lêkera ku di hevokê de peyva bingehîn e, yan li dawiya hevokê, yan jî di nava hevokê de ye.

Mînak:

- Roj çi bîne, ez ê wê binivîsim.
- Pirtûka min xwendî, tiştê bi min bide hizirandin, ez ê wê binivîsim.
- Ez dereng raketim.
- Îsal bi taybetî berf jî nebariya.
- Ta dawiyê, hevalên me dev ji me bernedan.

- Ji dema kevnar de, kurd koçber nebûne; beriya her kesî bi xakê ve hatine girêdan.

### b. Hevoka bêdestûr (bêrist):

Hevokên bêdestûr, hevokên ku lêkerên wan dikevin destpêka hevokê, yan jî bireser li pêşiya kirdeyê tê bikaranîn. Ev cure hevok, piranî di pendên pêşiyan, nivîsên hûnandî, roman û çîrokên ku cih didin axaftina rojane de, tên bikaranîn.

Mînak:

- Pendên pêşiyan: **"Sax dibe cihê xenceran, lê sax nabe cihê xeberan."**
- Helbest:

**"Nexweş im ez di evîna te de, dil bûye bîhok**
**Pîr û kal im ez dinalim, por spî bûye gulok**
**Şaş û cibe min çirandin, paşî bûme wek gerok"**

**Cegerxwîn**

- Axaftinên rojane:

**Diwêrî biçî goristanê tu?**
**Nehat hevala Dilvîn?**

### c. Hevoka netemambûyî:

Di van hevokan de pêveber nayên bikaranîn. Her çi qas pêveber neyên bikaranîn jî mirov tê derdixe ku pêveber çi ye.

Mînak:

- Tu yê nan bidî me?

Belê. (Belê, ez ê bidim.)

- Mala te ava. (Mala te ava be)

Ji van mînakên li jor "belê" û "mala te ava" kêmasiya wan diyar û berbiçav e. Ew jî weke ku li jor hatiye zelalkirin, pêveberên wan in.

**Têbînî:** Di hin hevokên netemambûyî de, dema ku pêveber veşartî be, sêxal tê bikaranîn.

Mînak:

- Derdê min, pir ...

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hevok, çi ye?
2. Hevokên li jêr li gorî rewşa pêveberê dabeş bike:
   **a.** Xwendekarên dibistana me pir in.
   **b.** Ew çûye Cizîra Botanê.
   **c.** Ev wane der barê hevalkaran de ye.
   **d.** Karê komî, pir bi sûd in.
3. Hevokên li jêr li gorî wateyê dabeş bikin:
   **a.** Ez naçim welatên biyanî.
   **b.** Ev heyber hat bişaftin.
   **c.** Ox! Ev agahiyên wêjeyî çi qas xweş in!
4. Pênc gihanekên ku hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî çêdikin, diyar bike û li ser her yekê, hevokekê saz bike.
5. Ji hevokên li jêr, kîjan bidestûr e û kîjan bêdestûr e?
   **a.** Dermanê jara tu yî
   Heyva li çarda tu yî
   Sêva li dara tu yî
   **b.** Çavên li deriyan, xwelî li seriyan.
   **c.** Karê nêvî, jê neke hêvî.

# BEŞA PÊNCEM

## Dahûrandina Hevokan

# DAHÛRANDINA HEVOKAN

**Her du hevokên li jêr bixwîne û bersiva pirsan bide.**

- Giya di bin keviran de namîne.
- Parastina xwezayê erkekî civakî û mirovî ye.

1. Cureyên van hevokan, li gorî çêbûn, cureya lêker û rewşê, cihê lêker û pêveberê û wateya wan, diyar bike.
2. Hêmanên her du hevokan diyar bike.

**Dahûrandina hevokê, tê wateya diyarkirina hêmanên wê. Dahûrandina hevokê di sê qonaxan re derbas dibe:**

**a. Qonaxa yekem:**

Cureyên hevokan: Di vê qonaxê de çêbûna hevokê li gorî cureyên lêkeran, cihê lêkeran û li gorî wateya hevokê, dê bê diyarkirin.

**b. Qonaxa duyem:**

Hêmanên hevokê: Di vir de hêmanên ku hevokê pêk tînin, dê bên dîtin: kirde, pêveber, bireser, têrker.

**c. Qonaxa sêyem:**

Di vir de hêmanên ku hevokê pêk tînin, ger ji yekê zêdetir ji peyvan pêk hatibe (komepeyv), dê çêbûna wan bê lêkolînkirin.

Mînak 1:

- **“Şagirtên çalak, îro di refê de pirtûk xwendin.”**

**Qonaxa yekem:**

**Cureya hevokê**

**a.** Çêbûna hevokê: Hevok xwerû ye.

**b.** Hevok li gorî cureya lêker û rewşê: Hevok lêkerî ye.

**c.** Hevok li gorî cihê lêker û pêveberê: Hevok bidestûr (birist) e.

**d.** Li gorî wateya hevokê: Hevok erênî ye.

**Qonaxa duyem:**

**Hêmanên hevokê**

**a.** Şagirtên lewaz: Kirde ye.

**b.** Îro: Têrker e (Hevalkara demê ye).


**c.** Di refê de: Têrker e (Hevalkara cih e).

**d.** Pirtûk: Bireser e.

**e.** Xwendin: Pêveber e.

**Qonaxa sêyem:**

**Komepeyv:**



Mînak 2:

**“Wan duh, xwendekarên serkeftî yên Saziya Ziman, ji bîr nekirin.”**

**Qonaxa yekem:**

**Cureya hevokê**

- **a.** Hevok xwerû ye.
- **b.** Hevok lêkerî ye.
- **c.** Hevok bidestûr (birist) e.
- **d.** Hevok neyînî ye.

**Qonaxa duyem:**

**Hêmanên hevokê**

- **a.** Wan: Kirde ye.
- **b.** Duh: Têrker e (hevalkara demê).
- **c.** Xwendekarên serkeftî yên Saziya Ziman: Bireser e.
- **d.** Ji bîr nekirin: Pêveber e (neyînî ye).

**Qonaxa sêyem:**

**Komepeyv:**

**1. Xwendekarên serkeftî**

**Navdêr V Hevalnav**

**Raveber V Raveker**

**Raveka hevalnavan**

**2. Xwendekarên serkeftî yên Saziya Ziman**

**Raveka hevalnavan V Raveka navdêran**

**Raveber V Raveker**

**Raveka Navdêran**

**3. Saziya Ziman**

**Navdêr V Navdêr**

**Raveber V Raveker**

**Raveka Navdêran**

Mînak 3:

**"Li gir, bi stûna spî ve xweş xweş dihejiya al."**

## Qonaxa yekem:

**Cureya hevokê**

**a.** Hevok xwerû ye.

**b.** Hevok lêkerî ye.

**c.** Hevok bêdestûr (bêrist) e.

**d.** Hevok erênî ye.

## Qonaxa duyem:

**Hêmanên hevokê**

**a.** Dihejiya: Pêveber e.

**b.** Al: Kirde ye.

**c.** Li gir : Têrker e (Hevalkara cih).

**d.** Bi stûna spî ve: Têrker e (Hevalkara cih).

**e.** Xweş xweş: Têrker e (hevalkara çawaniyê ye).

## Qonaxa sêyem:

**Komepeyv:**

**a) Li gir**

**Daçek Nav**

**b)**

| Bi | stûn | a | spî | ve |
|---|---|---|---|---|
| Daçek | Navdêr | V | Hevalnav | Paşdaçek |
| | Raveber | | Raveker | |

**Raveka hevalnav**

**c) Xweş xweş**

**Hevalkara çawaniyê ye**

Mînak 4:

**“Dar, çend mehên din, dê bi kulîlk bin.”**

## Qonaxa yekem:

**Cureya hevokê**

- **a.** Hevok xwerû ye.
- **b.** Hevok navdêrî ye.
- **c.** Hevok bidestûr e.
- **d.** Hevok erênî ye.


## Qonaxa duyem:

**Hêmanên hevokê**

- **a.** Dê bi kulîlk bin: Pêveber e.
- **b.** Dar: kirde ye.
- **c.** Çend mehên din: Têrker e (Hevalkara demê ye)

## Qonaxa sêyem:

**Komepeyv:**



## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hevokên li jêr, li gorî qonaxan dahûrîne.
   **a.** Qonaxa yekem: Cureya hevokê.
   **b.** Qonaxa duyem: Hêmanên hevokê.
   **c.** Qonaxa sêyem: Komepeyv.
      1. Têkiliyên civakî yên xweş, xerab nekin.
      2. Ma dara hinarê ji ya hejîrê ciwantir e?
      3. Hevalê Rênas bêyî pirsa xwe ji kesî bike, pirtûk nivîsî.
      4. Vê pirtûkê, xwendekar li pêş xistin.

# BEŞA ŞEŞEM

## Xalbendî û Destûrên Nivîsînê

Wane 1

# XALBENDÎ

Ji ber girîngiya rastnivîs û xalbendiyê ya di ziman de, em dê careke din hin destûrên ziman ên pêwîst û xalbendiyan, bi giştî bi bîra we bînin, tevî ku di salên borî de jî hatine dayîn.

## a. Xalbendî (hêmadanîn):

Her weke beriya niha jî me diyar kiribû ku xalbendî, xwendin û têgihîştinê hêsantir dikin, ser û binê hevokê û cihê bêhnvedanê nîşan didin. Her weha, di dema xwendinê de, em li gorî nîşanên xalbendiyê, peyvan dikirpînin û bêhna xwe berdidin.

**Em dikarin nîşanên xalbendiyê, weha rêz bikin:**

1- Xal (.)
2- Bêhnok (,)
3- Cotxal (:)
4- Xalbêhnok (;)
5- Pirsnîşan (?)
6- Baneşan (!)
7- Sêxal (…)
8- Dunik (“ ”)
9- Yeknik (‘ ’)
10- Dabir ( ‘ )
11- Kevanek ( )
12- Kevaneka çarçik [ ]
13- Bendik( - )
14- Xêzika axaftinê ( – )
15- Xêzika xwehr ( / )

## 1. Xal (.):

1. Bidawîbûna hevokê nîşan dide. Dema ku hevok diqede, mirov xalekê datîne dawiya hevokê. Peyva piştî xalê bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Doza azadiyê, doza mirovahiyê ye. Ji ber vê yekê, gelê me bi berdewamî têdikoşe.

2. Piştî peyvên ku hatine kurtkirin , xal tê danîn.

Mînak: Prof. Qenatê Kurdo, Zimanzan û wêjevanekî kurd e.

3. Ji bo ku xaneyên hejmaran ji hev bên veqetandin, piştî sê xaneyan, xal tê danîn.

Mînak: Dûrahiya Rokê ji Erdê, nêzî 150.000.000 km ye.

4. Di nivîsa dîrokê de, di navbera roj, meh û salê de, xal tê bikaranîn.

Mînak: Di dîroka 17.04.1946'an de, gelê Sûriyeyê serxwebûna xwe bi dest xist.

5. Di bîrkariyê de, xal weke nîşana hevdanê tê bikaranîn.

Mînak: 6 . 7 = 42

6. Di destnîşankirina xalên bingehîn de, xal tê bikaranîn.

Mînak: Mijarên me, ev in:

1. Hevalnav.
2. Cînav.
3. Navdêr.

## 2. Bêhnok (,):

1. Di hevokê de cihê ku mirov bêhna xwe lê vedide, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Heger hêvî hebe, hezkirina jiyanê dê bi pêş bikeve.

2. Peyv û komepeyvên ku xwedî heman peywirê ne, bi bêhnokê tên veqetandin û bêhnok cihê gihanekê digire.

Mînak: Azad, Alan, Ciwan û Elî karê xwe zû bi dawî kir.

3. Di nava hevokê de, piştî erêkirin û neyîniyê, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak:

- Erê, ez baş im.
- Na, ne wisa ye.

4. Di hevokên dirêj de, ji bo kirde ji hêmanên din ên hevokê bê veqetandin, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Rustem, di çîrokan de weke şêrê serê çiyayên Kurdistanê, dihat nasîn.

5. Piştî peyvên banglêkirinê, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Hevalên hêja, bi paş nekevin, ev roj roja me ye.

6. Di hejmarên şikestî de, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Serjimara şêniyên Sûriyeyê, di sala 2010'an de gihaşt 22,5 milyon kesî.

7. Di navbera dîrok û cihan de, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Kovara Hawarê, Şam, 15.05.1932

8. Di nivîsa çavkaniya gotarên lêkolînan de, bêhnok dikeve navbera nav, paşnav, navê berhemê û hwd.

Mînak: Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol, 2002.

9. Beriya hin gihanekan mîna: "çimkî, lewre, lê belê, lê..." bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Wî tiştek negot, lê ez têgihîştim.

10. Li pêş û paşiya hevok û hêmanên navîn, bêhnok tê bikaranîn.
Mînak: Berkevirê, gundekî Dirbêsiyê ye, warê şehîdan e.

11. Di hin hevokan de, ji bo ku peyv bê kirpandin, piştî wê bêhnok tê bikaranîn.
Mînak: Dilêrê mêrxas, bi rastî jî mirovekî comerd bû.

## 3. Cotxal (:):

1. Dema ku di nava hevokê de, tiştek tê vegotin an taybetiyên tiştekî tên rêzkirin, an jî wateya wê tê vegotin, cotxal tê bikaranîn.

Mînak 1: Hevalê wî lê nêrî û weha got: “Em ê te jî bibînin.” (gotina veguheztî)

Mînak 2: Tiştên ku mirovê baş ji yê xerab vediqetînin, ev in: dilpakî, wêrekî û camêrî ... (taybetî)

Mînak 3: Rengdêr: Ew peyva ku rengê navdêrê nîşan dide. (wate, pênase)

2. Dema ku mînak tê dayîn, cotxal tê bikaranîn.

Mînak: Alavên teknîkî yên ragihandinê pir in: telefon, enternet, faks.

3. Di bendên wêjeyî de, dema ku gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê, cotxal tê danîn.

Mînak: Nesrîn: Roj baş Hemrîn.
Hemrîn: Roj baş Nesrîn.

4. Di demê de, ji bo nîşana saet, xulek û çirkeyan, cotxal tê bikaranîn.

Mînak: Ez her şev, di saet 11:35’an de radikevim.

5. Di bîrkariyê de weke nîşana parvekirinê tê danîn.

Mînak: 15:5 = 3

## 4. Xalbêhnok (;):

1. Dikeve navbera du hevokên bihevvegirêdayî yên ku hev sergihayî dikin.

Mînak: Ga dimire çerm dimîne; mirov dimire nav dimîne.

2. Ji bo cudakirina komekên hevokên ku hêmanên wan bi bêhnokan, ji hev hatine cudakirin, xalbêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Ez pir bi coş û peroş im; ez dixwazim biqîrim, bistrêm, bibezim ...

3. Di mînakên ku tên rêzkirin de, yên ku ji aliyê cure û wateyê ve ji hev cuda ne, bi rêya xalbêhnokê ji hev tên cudakirin.

Mînak: Di kurdî de navê zarokên keç dikin Zozan, Sosin, Binefş; navê zarokên kur jî dikin Şêrgo, Hogir, Kawa ...

## 5. Pirsnîşan (?):

1. Tê dawiya hevokên pirsê. Pirs bi rêya çend alavên din yên weke: ma, qey, gelo ... jî tê kirin.

Mînak: - Kî hat?
- Ma tu naçî?
- Gelo we karê xwe bi dawî kir?

2. Dema ku agahiyên tên dayîn bi guman bin, pirsnîşan di nava kevanekê (?) de tê nivîsîn.

Mînak: Ehmedê Xanî, di salên (1651-1707?) de, di Nûbuhara Biçûkan de, gelek şîretan li zarokên kurd dike.

3. Di hevokên hevedudanî (kurt) ên pirsê de, pirsnîşan li dawiya hevoka dawî tê danîn.

Mînak: Te ew mijar xwend, çawa bû, te çi encam ji wê girt?

4. Pirsnîşan, li dawiya hevokên pirsê yên ku bêyî peyvên pirsê çêdibin (bi rêya kirpandinê), tê bikaranîn.

Mînak: Te xwarin xwar?

## 6. Baneşan(!):

Dema ku mirov bixwaze hestekî bilind (coş, xem, tirs kêfxweşî ...) nîşan bide, hêmaya baneşanê (!) li dawiya hevokê bi kar tîne. Bêjeya piştî baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Hiş be kuro! Bila kes dengê te nebihîze.

Ax, derdê me çi qas giran e!

Her weha, baneşan bi armanceke cuda jî tê bikaranîn. Dema ku di nava kevanekê de, li ber bêjeyekê bê bikaranîn, tê wateya ku nivîskar bi dijwateya wê, bawer e.

Mînak: Osman, mirovekî pir hişmend e (!)

## 7. Sêxal (...):

1. Piştî hevokên ku ji ber sedemekê nehatine temamkirin, sêxal tê bikaranîn.

Mînak: Min ew qasî bêriya te kiriye ku ...

2. Piştî mînakan, dema ku sêxal were bikaranîn, wateya pirbûna wan dide.

Mînak: Wî ji bazarê gelek tişt kirîn: xox, tirî, zebeş ...

3. Li şûna peyveke ku mirov naxwaze bi kar bîne, piştî hin tîpan, sêxal tê danîn.

Mînak: Pêşkêşvan, di bernameyê de jê re got:

- Te dîsa çi j... belav kiriye?

## 8. Dunik (“ ”):

1. Gotinên ku tên veguhestin, dikevin nava dunikê.

Mînak: Pêşiyên me gotine: “ Aqilê sivik barê giran e.”

2. Ji bo balkişandina li ser peyveke di nava hevokê de, ew peyv dikeve nava dunikê.

Mînak: Ew pirtûka wî ya “yekem” e.
Em li ser mijara “lêkeran” rawestiyan.

3. Navên pirtûk, rojname, kovar û nivîskaran, ji bo balkişandinê dibe ku di nava dunikê de, bên nivîsîn.

Mînak: Min duh beşek ji “Şerefnameyê” xwend.

## 9. Yeknik (‘ ’):

Dema ku mirov neçar bimîne hevoka di nava dunikê de careke din bixe nava dunikê, wê demê yeknik tê bikaranîn.

Mînak: Mamosteyê wêjeya kurdî ji min pirsî: “Dîwana ‘Kî me ez’ berhema kîjan helbestvanî ye?”

## 10. Dabir (’):

1. Dabir, di navbera kurtepeyvan û pêveka tewangê de, tê bikaranîn.

Mînak: YPG’ê rûmeta gelên rojavayê Kurdistanê parast.

2. Dabir, di navbera hejmar, veqetandek û pêveka tewangê de, tê bikaranîn.

Mînak: Di 15’ê Adara 2011’an de, Şoreşa Sûriyeyê dest pê kir.

3. Di kurdî de, pêvekên ku rêza hejmaran nîşan didin, bi dabirê ji hejmaran, tên veqetandin.

Mînak: Piraniya mamosteyên rojavayê Kurdistanê, li Kongra 1’em, amade bûn.

4. Dema ku di bêjeyekê de, dengek ketibe, yan jî bi taybetî hatibe xistin, li şûna wî dengî, dabir tê bikaranîn.

Mînak:

**Tev bi şewq û zêrîn in**
**Ronahiyê d’weşînin**

**(Salihê Heydo)**

## 11. Kevanek ( ):

1. Agahiyên ku cihgirtina wan di nava hevokê de ji sedî sed ne pêwîst bin, di nava kevanekê de tên nivîsîn. Bi derxistina van agahiyan, tiştek ji hevokê kêm nabe.

Mînak: Elî Herîrî (wêjevanekî kurd e) gelekî zana bû.

2. Carinan hemwateyên peyvan di nava kevanekê de tên nivîsîn.

Mînak: Em her roj wisa (weha) bi dilekî geş, diçin zanîngehê.

3. Bilêvkirina peyvên biyanî, di nava kevanekê de tên nivîsîn.

Mînak: Albert Einstein (Albirt Aynştayn), zanyarekî navdar e.

4. Dîrokên destpêkirin û bidawîbûnê, di nava kevanekê de tên danîn.

Mînak: Şerê yekem ê cîhanê (1914-1918) pir dijwar bû.

5. Di bendên şanoyê de, liv û tevgera lîstikvanan, di nava kevanekê de tê nivîsîn.

Mînak:

- Bapîr (hêdîka nêzîkî mêwefiroş bû û bi dengekî nizm) got: “Birazê ka du kîlo sêv bide min.”
- Mêwefiroş (bi lez ji cihê xwe rabû) got: “Tu bi xêr hatî apo, tu sêvên zer dixwazî, yan ên sor?”

6. Dema ku mirov agahiyekê ji berhemekê veguhêze, navê nivîskarê berhemê di nava kevanekê de, tê nivîsîn.

Mînak:

Mey nenoşî Şêxê Sen'anî xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet
Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanî xeta, kanî xelet

**(Melayê Cizîrî)**

7. Di veguhastinan de, cihê ku nehatiye veguhestin, di nava kevanekê de, bi sê xalan tê nîşankirin.

Mînak: Ehmedê Xanî, di berhema xwe ya navdar "Mem û Zîn" de bi van gotinan dabaşa Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran dike:

**(...)**
**Bînave riha Melê Cizîrî**
**Pê hey bikira Elî Herîrî**
**Keyfek wê bida Feqiyê Teyran**
**Heta bi ebed bimayî heyran**
**(...)**

## 12. Kevaneka çarçik ( [ ] ):

1. Dema ku di nava kevanekê de, pêwîstî bi kevanekeke din hebe, kevaneka çarçik tê bikaranîn.

Mînak: Helbestvanê navdar ê kurd Cegerxwîn (ê ji Hesarê [gundekî Kercewsê ye]) di Kovara Hewarê de, gelek berhemên xwe weşandine.

2. Ji bo hin hûrgiliyên nasnavan, tê bikaranîn.

Mînak: Feqiyê Teyran [Mihemed kurê Mîr Ebdal] destaneya "Zembîlfiroşê" nivîsiye.

3. Di wergirtinan de, ji bo ravekirinê, kevaneka çarçik tê bikaranîn.

Mînak: Pêvajo [pêvajoya şoreşê] dê bi dawî bibe.

## 13. Bendik/ Xêzika navberî (-):

1. Peyva ku di rêzê de bi cih nabe (hilnayê), bi bendikê/xêzika navberî tê veqetandin (bendik, li dawiya rêzê tê danîn).

Mînak: Di vê mijarê de, gotina xwe ya dawî got û pir-
sa te kir.

2. Dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de, hogirî heye.

Mînak: Heger tu biçî bajar, ji min re du-sê lênûsan bîne.

3. Di kîtekirina peyvê de, bendik/xêzika navberî dikeve navbera kîteyan.

Mînak: Mirov dikare peyva hilweşandin, weha dahûrîne "hil-weş-andin", lê belê kîtekirina wê bi awayê "hil-we-şan-din" pêk tê.

4. Dema ku pêvek, tên nîşankirin, bendik dikeve aliyê pêvekê yê bi peyvê ve, vedibe.

Mînak: Di zimanê me de, hin paşgir hene ku ji navdêr û hevalnavan, lêkerê çêdikin, mîna /**-andin**/ yek ji wan e.

## 14. Xêzika axaftinê (–):

Dema ku gotûbêj di navbera çend kesan de çêdibe, heke gotina yekî/ê di nava dunikê de, neyê nîşankirin, wê demê xêzika axaftinê li ber gotina wî/wê tê nivîsîn.

Mînak: Kawa ji hevalê xwe re got:

– Em kengî biçin malê?

Hevalê wî lê vegerand:

– Dema ku cot bi dawî bibe.

## 15. Xêzika xwehr ( / ):

1. Dema ku malikên helbestê li nik hev tên nivîsîn, bi xêzika xwehr ji hev tên veqetandin.

Mînak: Şox û şengê zuhre rengê / Dil ji min bir, dil ji min

2. Carinan du tiştên hemwate li nik hev tên nivîsîn, bi xêzika xwehr ji hev tên veqetandin.

Mînak: Piştî baran dibare, li asîman heftreng/keskesor derdikeve.

3. Di navnîşanan de, ji bo cudakirina tax, bajar û jimareya avahiyê, xêzika xwehr tê bikaranîn.

Mînak: Qamişlo/Cirnikê /Taxa Rojhilatê/Hej. 11

4. Di bîrkariyê de weke nîşana parvekirinê, tê bikaranîn.

Mînak: 6/3=2 10/2=5 36/6=6

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Erkên xalbendiyan çi ne?
2. Xalbendiyan, rêz bike, li ser her beşekî wan mînakekê binivîsîne.
3. Benda li jêr, bi baldarî bixwîne û hêmayên xalbendiyê yên pêwîst, di nava kevanekan de bi kar bîne:

Rojekê payîz hat û dunya hênik bû ( ) Hêdî ( ) hêdî ber bi sermayê ve diçû ( ) Daran pelên xwe diweşandin ( ) Ji dayîka mezin xwezayê pirsîn ( )

( ) Em gelek westiyane ( ) Ji havînê ve em di kar de ne ( ) Pêwîstiya me bi xewê heye ( ) Em dixwazin demekê razên ( )

Xwezayê got ( )

( )Bila ( ) xwe amade bikin ( ) ez ê ji we re kulavekî spî rêkim ( )

Pelan got ( )

( ) Em ê çi bikin ( )

Dayîka xweza got ( )

( ) Hûn bi dilê xwe ne ( ) Hûn dixwazin bilîzin ( )dixwazin razên ( )

Pelan got ( )

( ) Baş e ( ) Em ê bêhnekê bilîzin ( ) li dora dayîka xwe kom bibin û piştre razên ( )

Dar jî ketin xewa zivistanê ( ) heta biharê di xew de man ( )

# DESTÛRÊN NIVÎSÎNÊ (RASTNIVÎS)

Dema ku em dibêjin rastnivîs, tevahî destûrên nivîsê tên bîra mirov. Li ser hin peyvan zêdebûna pêvekan û guhartinên piştî wan çêdibin, peyv bi hev ve yan jî cuda tên nivîsîn, tîpên biçûk û mezin li ku derê tên bikaranîn. Li ser van xalan, em ê rawestin û hin destûrên nivîsê diyar bikin.

## 1. Peyvên ku bi tîpa biçûk dest pê dikin:

a. Navên rojan.

Mînak: în, şemî, pêncşem ...

b. Navên mehan.

Mînak: adar, tîrmeh, tebax, cotmeh ...

c. Navên zimanan.

Mînak: farisî, kurdî, rûsî, erebî ...

d. Navên gel û neteweyan.

Mînak: ereb, kurd, tirk, çerkes, suryan, faris ...

e. Navên bîr û baweriyên olî û hevalnavên bi wan pêk hatine.

Mînak: xirîstiyanî - xirîstiyan, cihûtî - cihû, misilmantî - misilman, bûdîzm - bûdî ...

## 2. Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:

a. Sertîpa bêjeya yekem a hevokê.

Mînak:

- Dayîka min ji mala xalê min tê.
- Gelo hûn ê kengî biçin serdana Sozdarê? Dema hûn çûn, gazî min jî bikin.
- Hewar! Kurê min tu çima weha dikî?!

b. Nav û paşnavên mirovan.

Mînak: Sebrî Botanî, helbestvanekî kurd ê navdar e.

c. Nasnavê mirovan, dema ku bi navê wan re bûbin yek û tevî navê wan, bên bikaranîn.

Mînak: Navê Sekretêra Giştî ya Partiya Sûrya Pêşerojê, Hevrîn Xelef e.

d. Serenavên cih, sazî, çem, derya, okyanûs, parzemîn, çiya û navê din ên erdnîgariyê, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak:

- Navên cihan: Mezopotamya, Amed, Şengal, Dirbêsiyê, Şehba.
- Navên rêxistinan: Rêxistina Mafên Mirovan, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Însiyatîfa Dayîkên Aştiyê, ...
- Navên çeman: Dîcle, Ferat, Nîl, Zap, ...
- Navên deryayan: Beltîq, Manş, ...
- Navên okyanûsan: Pasîfîk, Hindî, ...
- Navên parzemînan: Asya, Afrîka, Ewropa, ...
- Navên çiyayan: Hîmalaya, Agirî, Zagros, ...

e. Di navên ku ji ravekekê pêk tên de, heke hevenavek bûbe parçeyeke serenavê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Çiyayê Toros, Deşta Heranê, Birca Belek, ...
Lê heke ew hevenav ne parçeyeke serenav be, biçûk tê nivîsandin.
Mînak: Ew çemê ku di Endîwerê re dibûre, Dîcle ye.

f. Navên roj û serdemên taybet, bi tîpa mezin dest pê dikin.
Mînak: Roja 21'ê Adarê li gelê me pîroz be.

g. Alî, dema ku bi wateyeke taybet bên bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dikin.
Mînak: Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, di 19'ê Tîrmehê de, dest pê kir.

h. Navê xizmatiyê, dema ku bûbe nasnav û bi nav re bûbe yek, mezin tê nivîsîn. Lê heke nebûbe parçeyeke serenavê, wê demê bi tîpa biçûk dest pê dike.
Mînak: Dema ku ez çûm Dêrikê, min Apê Mûsa dît.
Ez çûm Tirbespiyê, min apê xwe Mûsa dît.

i. Seretîpa bêjeya yekem a veguhestî; ango hevoka di nava dunikê de, mezin tê nivîsîn.
Mînak: Ferhad got: "Ez wî mirovî baş nas dikim."

j. Di serenivîsan de, ji bilî gihanek, daçek û veqetandekên ku cuda tên nivîsandin, hemû bêje bi tîpa mezin dest pê dikin.
Mînak: Wî nivîsa bi navê "Raman û Ziman" xwend.
Mînak: Romana bi navê "Çiyayên bi Xwînê Avdayî", pir xweş e.
Mînak: Tevgera Demokratîk a Demên Dawî.

k. Hevoka ku piştî cotxalê tê, bi tîpa mezin dest pê dike. Lê heke piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka pêşîn jî bi tîpa biçûk dest pê dike.

Mînak: Zerdeşt dibêje: “Baş bihizire, baş biaxife û baş pêk bîne.”
Mînak: Navdêr li gorî zayenda xwe dibin du cure: nêr û mê.

l. Dema ku yek bixwaze balê bikişîne ser tiştekî, wî tiştî bi tîpên mezin dinivîse.

Mînak: ASTA PÊŞKETINA ZIMAN, ASTA PÊŞKETINA JIYANÊ YE.

m. Seretîpa navê taybet ê ku li lawiran tê kirin, mezin tê nivîsîn.

Mînak: Piştî çend rojan, dê Kanûn bizê (Kanûn; navê çêlekekê ye).

n. Navên pirtûk, kovar û rojnameyan, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: Min îro ji “Zordestname” çend bend xwendin.
Mînak: Kovara “Asoya Jinê” mehane tê weşandin.
Mînak: Rojnameya “Azadiya Welat” pir dewlemend e.

## 3. Rastnivîsa lêkeran:

a. Dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, pêveka dema niha “di-”yê û pêveka neyîniyê “na-”yê dikevin navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

Mînak:

Rabûn —pêveka dema niha (di)→ radibe
Rabûn —pêveka neyîniyê (na)→ ranabe

Her weha di van lêkeran de (lêkerên pêkhatî), di dema bê, raweya fermanî û raweyên daxwaziyê de pêveka “bi-”yê ji holê radibe.

Mînak:

- Tu yê dakevî jêr?
- Derî veke da em derkevin.
- Ez dixwazim zû rakevim, ji ber ku sibe ezmûna min heye.

b. Lêkerên hevedudanî û biwêjî, dema ku weke lêker bên kişandin, hêmanên lêkerê ji hev cuda tên nivîsîn. Lê dema ku weke navdêr bin an jî di avaniya tebatî û dançêker de bin, bi hev ve tên nivîsîn.

Mînak:

- Ez xwe ji bo ezmûnê amade dikim.
- Min bawerî pê anî, ji ber ku ew kesekî rast bû.
- Biryardan hêsan e, lê destpêkirin dijwar e.
- Bingeha xebatê bi destê me hat amadekirin.
- Min bingeha xebatê da destpêkirin.
- Min ew bi kar anî. Ew hat bikaranîn.

c. Di hin lêkerên biwêjî de cînavên lihevxistî “lê, tê, pê, jê” bûne parçeyeke peyvê û rista pêşgiran bi cih tînin û ji peyvê nayên cudakirin. Mîna: jêkirin, lêkirin, têgihîştin ...

Mînak:

- Apê te xaniyekî mezin li gund lêkir.
- Te çima şaxa vê darê jêkir?
- Xwendekarên me zû têdigihêjin, ji ber ku ew pir jîr in.

## 4. Nivîsa tîpa “î”yê beriya tîpa “y”yê:

Dema ku beriya tîpa “y”yê tîpa “î”yê bê, ev tîp kurt dibe û dibe “i”. Ji ber ku “y” tîpeke nîvdengdêr e, “î” kurt dibe.

Mînak:

- Derî ——— Deriyê mala me pir teng e.
- Hêvî ——— Hêviya min qet jê nema.
- Gulî ——— Wî guliyên darê jêkirin.

## TÊBÎNÎ

* Li gorî hin zimanzan û pirtûkên rêziman, ev tîp wekî xwe dimîne û nayê kurtkirin.

Mînak:

- Derîyê mala me pir teng e.
- Sazîya Minhacan, li bajarê Amûdê ye.

* Dema ku tîpa “**î**” û “y”yê ji hev cuda bên nivîsîn, “**î**” nayê kurtkirin û weke xwe dimîne.

Mînak: Ew kî ye?

## 5. Nivîsa tîpa “û” beriya tîpa “w”:

Dema ku beriya tîpa “w” tîpa “û” bê, ev tîp kurt dibe û dibe “i”.

Mînak:

- Rû ——— Ez nikarim li riwê wî binêrim.
- Xwesû ——— Xwesiwa wî ji pirtûkan hez dike.

## 6. Nivîsa daçek û qertafan:

Daçek, peywirên cuda li peyvê bar dikin û bi piranî ji peyvan cuda tên nivîsîn.

Mînak:

- Ew bi şûn de çû.
- Bi xêr hatî kekê min.

a. Daçekên “bi, bê” û qertafa “ne” yê dema ku rista pêşgiran bi cih tînin û navdêr û hevalnavên nû çêdikin, bi bêjeyê ve tên nivîsîn, lê dema ku hevalkaran çêdikin, cuda tên nivîsîn.

Mînak:

- Ew nanê bêxwê dixwe.
- Ev tiştekî bikeys e
- Ew xwarinê bi xwê dixwe.
- Ev mirovekî nexweş e.

b. Hin hevalnav hene ku ravebera wan ketiye û weke navdêr tên bikaranîn, di wan hevalnavan de jî daçek bi peyvê ve tên nivîsîn.

Mînak:

- Li bêkesan xwedî derneketin.
- Bêwijdan li mala xwe rûdinin.

c. Daçekên hevedudanî ji hev cuda tên nivîsandin.

Mînak: di rex de, bi şûn de, bi jor ve, ...

d. Di hin peyvan de, daçekên hevedudanî yên ku ji daçek û paşdaçekê pêk tên, dema ku daçek bikeve, paşdaçek bi bêjeyê ve tê nivîsîn.

Mînak: dûre, piştre, lewre, peyre ...

Ev daçek, di bingeha xwe de, bi vî awayî bûn: di dû re, di pişt re, ji lew re, di pey re …

## 7. Nivîsa veqetandekan:

a. Veqetandekên "-a", "-ê", "-ên" peyvê bi ravekerê ve, têkildar dikin û bi peyvê ve tên nivîsîn.

Mînak:

- Salên xweş li pey me man.
- Kevirê reş ji me re bînin.
- Hêviya me hîn jî heye.

b. Di ravekên têkel (zincîrî) de, veqetandek peywira cînavê digirin ser xwe û cuda tên nivîsîn. Heke peyva beriya veqetandekê bi tîpa dengdêr biqede, tîpa kelijandinê ''y'' tê pêşiya veqetandeka serbixwe û dibe ''ya'', ''yê'' û ''yên''.

Mînak:

- Şaredariya gel a Çilaxayê.
- Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê.

## 8. Gihanek û hevalkarên hevedudanî, bi giştî ji hev cuda tên nivîsîn.

Mînak: her weha, her tişt, ew qas, çi qas, her tim, tu kes, tu carî, ...

**9. Qertafên kesane, bi lêkeran ve tên nivîsîn, lê ji heval-nav, cînav û navdêran cuda tên nivîsîn.**

Mînak:

- Ez diçim pirtûkxaneyê.
- Ez baş im.
- Tu şagirt î?
- Em in xwediyê vê xakê.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Kengî peyv bi tîpên biçûk dest pê dikin?
2. Pênc rewşên ku peyv bi tîpa mezin dest pê dike, diyar bike.
3. Dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, di dema niha û neyînîyê de, çawa tê nivîsîn?
4. Daçekên “bi, bê”yê û qertafa “ne”yê dema ku rista pêşgiran bi cih tînin, çawa tên nivîsîn?
5. Daçekên hevedudanî yên ji daçek û paşdaçekan pêk tên, dema ku daçek dikeve, çawa tên nivîsîn? Bi mînakan diyar bike.
6. Mijarekê li ser wêjeya kurdî binivîsîne û tê de, li hêmanên hevokê, cure, rastnivîs û xalbendiyan baldar be.

## Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Nêrînên Derbarê Ziman de | Nêrînên Derbarê Ziman de |
| Cotmeh | Lêkolîn | Veqetandek | Veqetandek | Ravek |
| Mijdar | Ravek | Hevalnav | Hevalnav | Hevalkar |
| Berfanbar | Hevalkar | Daçek | Lêkolîn | Gihanek |
| Rêbendan | Gihanek | Lêveger | | |
| Reşemeh | Hêmanên Hevokê | Hêmanên Hevokê | Hêmanên Hevokê | Hêmanên Hevokê |
| Avdar | Cureyên Hevokê | Cureyên Hevokê | Cureyên Hevokê | Dahûrandina Hevokan |
| Cotan | Dahûrandina Hevokan | Dahûrandina Hevokan | Xalbendî | Xalbendî |
| Gulan | Destûrên Nivîsînê | Destûrên Nivîsînê | | |